Gotarên Mêyane

Rewşenbîr û desthelat

Tirîfe Doskî

Rojane ji zardevê bîjinekê guhdar dibin, gaz nîne, yan kirê girane. Ji layekî din ve ji giropên gencan dewa kar û xebatê dikin. Her wekî din Cada bê ser û berin û htd... Ji gazindên pêdewîstên jiyana rojane. Lê rexnegirtina çîneka bilindtir wek ast, hizir, xwast, armancên komelayetî, netewayetî û aborî, helbet bi şêweyekî din dihêne gotin û rexnegirtin. Lê, rexnegirtin li desthelatî bi xwe çi ye?

Renge rexnegirtin li desthelatê, di navbera nivîser û hevwelatî de cudahiyek hebe. Eve wata hindê nade ku cudahî di çemkê herdukan de heye. Her hevwelatiyek nabe rewşenbîr, belê her nivîser, yan rexnegirek hevwelatiye. şêwazê rexngirtinê û têgehiştina rexnê cudaye di navbera herdukan de.

Rojane ji zardevê bîjinekê guhdar dibin, gaz nîne, yan kirê girane. Ji layekî din ve ji giropên gencan dewa kar û xebatê dikin. Her wekî din Cada bê ser û berin û htd... Ji gazindên pêdewîstên jiyana rojane. Lê rexnegirtina çîneka bilindtir wek ast, hizir, xwast, armancên komelayetî, netewayetî û aborî, helbet bi şêweyekî din dihêne gotin û rexnegirtin. Lê, rexnegirtin li desthelatî bi xwe çi ye?

Rexnegirtin wata beşdarîkirin, giftûgokirin û avakirina hêzeka palpişt bo cemawerî di nava desthelatê de, ji layê reweşenbîran ve, hewildaneke bo helsengandina siyaseta desthelatê. Rexnegirtin wata nirxandina wê desthelatê dema rexne dike. Destehlatê

dike layanekî pêwîste mixataba wî bike ta ku di qalibê xwe de nemîne û cure gihorînek bi xwe ve digire. Belê rexnegirtin bi giştî ne tinê di alayê desthelatî de. Belku li aliyên din jî wek bihayek bi nirx û bi mifa û pirî rehendên exlaqî li qelem nadin. Belku babetek bo şikandin û ruswakirin û kêmkirin dizanin hindek reşenbîr cure rexnegirtinê dinivîsin cure rexnek dihê nivîsîn. Lê mirov dixwîne hest jê dike eve hewleke bo herifandina wê desthelatê. Ji bilî bi xwe rexngirtin ji wî astê bilindtire û bihatire ku armanca wî/ê helweşandin be rexngirtina desthelatê armanc jî (ew e bihakirina wî aydolojiyayê ye. Rawestana li ser kêmasiyên wê ta pir bike, Hewaleke bo çêkirina pireka mukim di navbera desthelat û hevwelatî de. Renge pirsiyar li vê derê dirust bin

Aya çi desthelat hene rexnê qibul nekin û yan jî çi desthelat hene rexnê qibul dikin?

Ew desthelatê rexnê û beşdariya hevwelatiyan û rewşenbîran bi başî dibe û qebul dike, bêguman desthelatek dîmukratiye û her destelata rexne qebulkirî bi ser ketiye û pirosêsa wê mezintir û başatir bûye. Her desthelata pirî guman ji aydolojiya xwe û kesayetên destheladarên xwe rexnê qebul nakin û dûr ji pirinsîpên exlaqî û mirovayeti siyaseta xwe mezin dikin û hevwelatiyan ji xwe dûr dike. Ew desthelat lawaz û kiz bûye

Belê, aya me rewşenbîr heye, hizir û rawestanî li ser rexnegirtinê bike, dûr ji armancê xwê taybet? Rewşenbîr li her welatekî dabeş dibin li ser çend layenên cuda cuda û her kes li gor berjewendiya wî desthelati dinivîse û rexne li ya din dike. Çînek ji rewşenbîran heye dûr ji hemû aydolojiya xwe dibîne û dengî wan nagehê çi minbera evro rewşenbîr têwerek mal, zik, otomobîl, xanî û zevî lê wek berhemek hizirî û rexneyî gelek birsiye. Cure rewşenbîr hene û hebûne li ber dahol her zemanekî xwe badin û ya çûye ji bîr dikin wek maran li gor wextî xwe digihurin, xwe hilî dikin û gotara rexneyê dûr dikin ji rastiyê. Eve rexneke bo reşenbîran da şûnasî xwe berze nekin...